**Pirsên li ser CoronaSchVO-ya ji 20ê çirîya paşîn ve dê di rewacê de be Pir Tên Kirin**

*Mebesta kêmkirinên bêtirkirî çi ye?*

Di hefteyên paşîn de enfeksîyonên koronavayrûsê qat bi qat bêtir bûn. Eger bi vî awayî pir bibe dê li ser sîstema xwedîkirina sihetê bibe barekî giran. Mebesta van tevdîrên hişk kêmkirina jimarên belavbûnê û herweha nehiştina têkçûna kapasîteya sektura xwedîkirinê û nehiştina derketina ji kontrole ya rêyên şofê ye.

*Qaydeyên Parastina ji Koronavayrûsa Nû li ku derê di rewacê de ne?*

Qayde ji bo hemû deverên gelî di rewacê de ne. Ev, ew hemû dever in ku nakevin çarçoveya taybet a parastina madeyê 13an ê qanûnî.

*Gelo divên mirov li cîhê taybet jî fermanên qanûnî pêk bînin?*

Lê çawa, li hemû cîhên mumkin bin! Her kesê ku kapasîteya têgihîştina wî ya qanûnên hîmî yên li ser parastina enfeksîyonê hebe divê li gora wê tevbigere û xwe û yên din ji xeterên belavbûnê yên dûrketina ji wan mumkin in biparêze. Ji vê re li cîhên taybet jî tevgera bi berpirsîyarî divê. Hedefa di meha çîrîya paşîn de, bi rawestandina zû bêtirbûna jimarên belavbûnê nehiştina barê dijwar ê sîstema sihetê û xwedîkirinê ye.

*Gelo dê qaydeyên nû li xwandingehan û navendên biro yên xwedîkirinê bên xistin rewacê?*

Di serîya serî de çalakîyên navendên xwedîkirina biro yên zarokan û yên xwandingehan, fermanên qanûnî yên bere yên Qaydeyên Parastina ji Koronavayrûsê neguherîne.

*Di deverên gelî de çend kes dikarin bên kêleka hev?*

Li deverên gelî divê bi kêmayî navbera 1,5 mîtroyî di nava her kesî de bê hiştin.

Ev bi tenê di rewşên awarte de dikare bê piştguhkirin:

- Eger herî pir mirovên ji du malan bên kêleka hev, herî pir ji 10 kesan re dikare destûr bê dayîn
- Bi sebebên bi xwedîkirinê ve têkildar yan gava hevaltîya kesê(n) piçûk ên ji wan re alîkarî divê bê kirin
- Tevlî çalakîyên li derveyê avahîyên wan ên têkildar, li xwandingehan û navendên xwedîkirina biro
- Ji bo zarokên li cîhên leyîstinê yên gelî
- Di çûnûhatina komî de
- Di rewşên awarte de, di bizavên agirvemêrîyê û polîsî de
- Di kombûnên gelek bilez ên bi karî ve têkildar de
- Di cenazeyan de û zewicandinên beledîyeyan de di nava xizmên nêzîk de

*Divê navbera muzîsyenan çi qas be?*

Sitranbêj û kesên amûrên pifkirinê dijenin, divên di nava xwe û kesên din de 2 mîtro navbera bêtir bihêlin.

*Divên maske li ku derê bên lixwekirin?*

Fermanên qanûnî yên bere neguherîne. Qaydeya hîmî ew e ku li hemû cîhên ku navbera herî kêm nikaribe bê parastin, her car maske bên lixwekirin. Li cîhên girtî yên gelî de, eger ew dever ji mişterî û serdêran re vekirî bin gava pêdivêya navbera herî kêm bê pêkanîn jî divê maske bê lixwekirin. Fermanên qanûnî yên bere ji bo çûnûhatina komî, xwandingehan û navendên xwedîkirinê yên biro her wek xwe mane.

Kesên ku pêdivêyên maskeyê bi cîh neynin dê ji bikaranîna avahîyan û xizmetan bên dûrxistin.

*Gelo ez ê karibim herim serdana xizmên xwe yên li avahîyên nexweşên razandî?*

Bi şertê ku şîret û fermanên Dezgeha Robert Kochî bên pêkanîn û pîlanên taybet ên serdana avahîyê hebin, nexweşên li avahîyên sihetê û xwedîkirinê yên bi razanê dê karibin hê jî serdêran qebûl bikin. Fermanên qanûnî yên herêmî divên bi dûrxistina bi temamî ya nexweşan neyên encamdayîn.

*Gelo di xizmetên hînkarîyê yên derveyê xwandingehê de hîç kêmkirin hene?*

Erê. hemû xizmetên hînkarîyê yên bi hînkirinê û karkirinê ve têkildar nînbin hatine qedexekirin. Ev nemaze bi peyderkirina xizmetn sîporê yên ji alî peyderkarê hînkirinê ve, xizmetên xwandingehên muzîkê ve, ji bilî van jî xizmetên rekreasyonê yên ji bo mezinan û zarokan peyderkirî ve têkildar e.

Lê avahîyên civatî ûyên xizmetên gencan didin, dê karibin heta ji bo 10 kesan vekirî bimînin.

*Gelo destûra sinifên ajovanîyê û azmûnên ehliyete tê dayîn?*

Erê. Di navgînan/wesayîtan de bi tenê xwandinkar, hînkar, namzedên hînkarîyê û wezîfedarên azmûnan dikarin hebin.

*Dê çi bi avahîyên kulturê bibe?*

Li tiyatroyan, operayan, eywanên konsertê, sînemayan û avahîyên din ên gelî yan taybet (kulturî) konsert yan pêkanîna nîşandanê heta 20yê çîrîya paşîn a 2020î hatine qedexekirin.

Ev herweha ji bo muzeyan, pêşangehên kulturî, galerîyan, koşkan, abîdeyan û çalakîyên li avahîyên wek van jî di rewacê de ye. Dê ji zemanên tecrîbekirina ji bo karpêdanê re jî di vê dewrê de hê jî destûr bê dayîn.

Bi tenê bi şertê ku di nava tirimpêlan de navbera 1,5 mîtroyî hebe dê ji sînemayên bi tirimpêl re destûr bê dayîn.

*Dê ji avahîyên sîpora amatur çi bibe?*

Li hemû avahîyên sîporê yên gelî û taybet, eywanên jîmnastîkê, hewzên melevanîyê û avahîyên wek wan de sîporên bi mebesta kêfê û yên amatur pêk tên heta 30yê çîrîya pêşîn a 2020î hatine qedexekirin. Kesek bi serê xwe, bi kesekî din re yan bi tenê bi kesên ji navmala xwe re li derveyê sîpora hundirî sîporê bike ev îstîsna ye. Sîporên bi tîm û bi bihevvebûn, tevlî cîhên derve, bi awayê demkî/mueqet hatine qedexekirin.

Ji atletîzma xwandingehan re azmûnên atletîzma pratîk ên ji bo lêkolînên akademik re û ji hînkirinê re li navendên xizmeta eyaleta Bakurê Ren-Vestfalyayê û li navendên federal destûr tê dayîn.

*Ji sîporên profesyonel re destûr tê dayîn?*

Ji pêşbazîyên lîgên profesyonel, sîporên siwarîyê yên profesyonel û pêşbazîna hespan û sîporên din ên profesyonel re, eger hemû pêdivê pêk bên û konseptên rewa yên parastina ji enfeksîyonê hebin, destûr tê dayîn. Heta tarîxa 30yê çîrîya paşîn a 2020î tevlîbûna temaşegeran a li pêşbazîyan qedexe ye. Ji hînkirinên profesyonel ên sportvanan re destûr tê dayîn.

*Dê bi avahîyên bi mebesta bêhnvedanê û kêfê çi bibe?*

Heta tarîxa 30yê çîrîya paşîn çalakîyên avahîyên jêrîn hatine qedexekirin:

- hewzên avjenîyê, parkên avê, avgerm, avgermên mizdanê û avahîyên wek wan,
- parkên kêfê, cîhên hundirî yên leyîstikê û avahîyên bêhnvedanê yên wek wan (cîhên hundirî û cîhên derveyî),
- qumarxane, firoşkarên ganyanê û avahîyên wek wan,
- klab û avahîyên wek wan
- kerxane, cîhên rêncberîya cinsî û avahîyên wek wan,
- geştên keştîyan, vagonan, tirênên kevnar û wek wan.

*Di kirînên dikanên parekende (sabit) de kêmkirin hene?*

Dê hemû cîhên sabit ên parekendeyî vekirî bimînin. Li dikanên parekendeyî li gora biryara NRWa parekendeyî jimara mişterîyan serê her deh mîtroya çargoşeyî nikare bêtirî kesekî hebe.

Ev fermana qanûnî ji bo avahîyên xebitandinê yên esnafan û peydekarên xizmetê jî bi heman astê di rewacê de ye.

Muze, pêşangeh, bazarên salanî, bazarên taybet û çalakîyên wek wan heta 30yê çirîya paşîn a 2020î qedexe ne.

*Gelo ji bo xizmetên ku ji wan re nêzîkbûna fizîkî divên destûr tê dayîn?*

Berî her tiştî pêkanînên rûyî, çêkirinê, çêkirina neynokan, manîkur, mizdan, deq û pîrsîngê, xizmetên ku di nava yekî û mişterîyî de bi kêmayî navbera 1,5 mîtroyê nikaribe bê hiştin û ew pîşe heta 30yê çirîya paşîn a 2020î hatine qedexekirin.

Ev ên jêrîn ne di nava wan de ne:

- rêncberên pîşeyan û peydekarên xizmeta xwedîkirina sihetê (wek pisporên dermankirina fizîkî, dermankirên pîşeyî, ebe, patologên axaftinê, odyolog, optîsyen, yên solên ortopedik çê dikin filan)
- eywanên çêkirina pêyan û berberan
- pîşe û xizmetên ji alî tibbî ve divên
- bi mebesta bazirganîyê ji bo kesan bi tirimpêlê pêkanîna veguhestinê.

*Ji çalakîyan û kombûnan re destûr tê dayîn?*

Çalakî û kombûnên di fermanên taybet ên qanûnî yên Qaydeyên Parastina ji Koronavayrûsê de tune ne heta 30yê çirîya paşîn a 2020î qedexe ne.

Li gora rewşê û bi şertê ku qaydeyên taybet bên pêkanîn, tevlî hin rewşên din, ji yên jêrîn re hê jî destûr tê dayîn:

- Kombûna li gorî Qanûnê Kombûnê (wek nimûne çalaki)
- Wek nimûne wek kombûnên partîyên siyasî yan dayîna xwîynê, qedandina pêdivêyên hîmî yên xelqê, dewamkirina ewlehî û birêkûpêkîya gelî yan kombûnên ji bo destekkirina xizmeta gelî û firehîyê
- Kombûnên encûmenan yên nikarin bi awayê dîjîtal bên pêkanên û palpişta wan a ḥiqûqî heye
- cenaze
- zewicandinên belediyeyan.

*Xwaringeh û avahîyên xizmeta xurekîyê dikin vekirî ne?*

Heta 30yê çirîya paşîn a 2020î çalakîyên xwaringehan, xanan, avahîyên berhemên pakêtkirî, paban, kafeyan û avahîyên din ên xurekîyê hatine qedexekirin. Cîhên xwarina şîrketan û cîhên xwarinê yên cîhên hînkarîyê (wek nimûne xwandingeh û unîversîte) ji bo xizmetkirina bikarînerên û rêncberên xwe dikarin vekirî bimînin. Bi tenê ji teslîmkirin û barkirina xwarin re destûr tê dayîn.

*Ji geştên gerokan re destûr tê dayîn?*

Na. Qûnaxvegirtinên şevanî yên bi mebesta geştê yên piştî 29ê çîrîya paşîn a 2020î dest pê bikin heta 30yê çîrîya paşîn a 2020î hatine qedexekirin. Bikarhatina milken ji alîyê bikarînêrên destûrdar ve her tim kirêkirî yan yên xwedîyên wan hebin û xanîyên gerok ên her car sabitkirî, RV filan geşt nayên hesabê û destûr ji wan re heye.

*Gelo dê çavdêrîya pêkanîn yan pêkneanîna qaydeyan bê kirin û cirma binpêkirinan çi ye?*

Hemû meqamên berpirsîyar û wezîfedarên dewletê dê van qaydeyan bi awayekî çalak û bi îstîqrar pêk bînin û eger bivê dê bi zorê jî bidin kirin.

Binpêkirin sûcê birêvebirîyê tê hesabê. Ev dikarin bi hetanî 25.000 Euro pere bên cirmkirin.